

## PAKETA PERWERDEHÎ Û BEŞ-DARBÛNÊ ÇI YE?

Bi diravdayînaji bo perwerdehî û beş-darbûnêre, za-rok, ciwan û ciwanên têgihiştî ji bo pêşveçûna kesane û beşdarbûna di jiyana civakî de îmkanên çêtir bi dest dixînin.Bi di-ravdayînên cûrbecûr yên ji bo perwerdehî û beşdarbûnêzarok, ciwan û ciwanên têgihiştîkû ji mal-batên kû hewcedariya wan bi piştgiriya aborî heye tên, piştgirîyawan tê kirin.Bi van diravdayînên, zarokê we dikare di sazîya lênêrîna rojane ya zarokan de, di dibis-tanê de û ji bo derbas  kirina demên vala pêşnîyazan bi kar bîne, eger wekî din hûn nikaribin lêçûnên kû ji bo ew tiştan hewce ne, bi xwe bidin.Beşdarbûn tê wê wateyê kû hemû mi-rov beşdarê her tiştê bibin û beşdarî jiyana civa-kî bibin.Ev tê wê wateyê kû, wek nimûne, zarok û ciwan biçin yek komeleya werzîşê û bi hev re fûtbolê bilîzin.An jî fêr bibin ka meriv çawa li yek dibistanekê muzîkê de yek amûrekê lê dixe.



## TÊKILÎ Û AGAHÎYA ZÊDETIR

Stadt Duisburg
**E-Mail** but@stadt-duisburg.de
**Telefon** 0203 940 00
**Web** duisburg.de/but

Der Oberbürgermeister [Şaredarê Sereke]
**Amt für Soziales und Wohnen 50-23 BuT**
**(Daîreya Karûbarên Civakî û Xanîyan 50-23 BuT)**
Beekstraße 38
47051 Duisburg

Jobcenter Duisburg
(Navenda Kar ya Duisburgê)
**E-Mail**
jobcenter-duisburg@jobcenter-ge.de
**Telefon** 0203 302 19 10
**Web** jobcenter-du.de/but



Ji bîr nekin!

# PAKETA PERWERDEHÎ Û BEŞDARBÛNÊ.

### PIŞTGIRÎYA ZÊDE JI BO ZAROKÊN WE.

- ✔ Materyalên ji bodibistanê.
- ✔ Dersa taybetî.
- ✔ Rêwîtiyên Sazîya lênihêrina rojane yazaro-kan û seyranên sazîya lênihêrina rojane ya zarokan.
- ✔ Rêwîtiyên bi polê va û seyranên dibistanê.
- ✔ Xwarina nîvro di sazîya lênihêrina rojane ya zarokan û dibistanê de.
- ✔ Mesrefên veguhestina xwendekaran.
- ✔ Çalakiyên dema valayê.

Tenê serîlêdanapêk bîninû ew pêk were!

jobcenter Duisburg

DUISBURG am Rhein



## KÎ DIKARE EW XIZMETAN BI DESTÊ BIXE?

Hemî zarokên kû di nav malbata we de dijin, ew dikarin alîkariyên ji bo perwerdehî û beş-darbûnê werbigirin, heke zarokê we ji van xizmetên hikûmetê yên jêrîn werbigire:

- ✘ Pêveka pereyên ji bo zarokan
- ✘ Pereyên hevwelatî (Bürgergeld)
- ✘ Pereyên Civakî
- ✘ Alîkariya Civakî
- ✘ Alîkarîya ji bo kîraya xanîyê
- ✘ Pereyên- ji bo Penaberan

Xwendewanên jin û xwendewanên zilam heta 25 saliya xwealîkariyênji bo perwerdehî û beşdarbûnê werdigirin, heger ew biçin yek dibistana giştî – an ji yek dibistana pîşeyî û pereyên ji bo perwerdehîya pîşeyî negirin.

Hemû zarok û ciwanên kû hewcedar in, ew heta 18 saliyê xwe ji bo beşdarbûna jiyana civakî û çandî ya di civakê de, ew alîkarîyê werdigirin.



## EZ ÇAWA SERÎLÊDANAÊ JI BO EW EW ALÎKARÎYÊ PÊK TÎNIM?

Heger hûn Pereyên hevwelatî  wergirin, wê gavê hûn dikarin ew serîlêdanaa xwe li cem navenda kar ya xwe de pêk bînin.

Di hemû rewşên din de, ji kerema xwe re ew serîlêdanaa xwe li cem bajarê Duis-burgê de pêk bînin. Hûn dikarin formên serîlêdanê di înternetê de li ser malpêra duisburg.de/but an jî, ji navendên xizmet-guzariyê yên hemwelatiyên xwe bistînin. Belgenameyên kû we tijî kirine bişînin:

Stadt Duisburg,
Amt für Soziales und Wohnen, Bildung und Teilhabe,
Beekstraße 38, 47051 Duisburg

Şêwirmendên BuT dê ji bo tijîkirin û şandina ew belgenameyan ji we re bibin alîkar: Kereme xwe rê li ser hejmara telefonê ya **0203 54 42 41 43** an jî e-maîla **butberatung1@werkstadt-duisburg.de** randevûyekê çêbikin.

## EZ JI BO ÇI EW PIŞTGIRIYÊ WERDIGRIM?

Di yek salê de heya 180 euro ji bo çalakiyên dema vala yên wekî beşdarbûna komeleya werzîşê an ji çûyîna yek dibistanekê muzîkê.

Vegirtina lêçûnên ji bo rêwîtiyê, şeva xwe li cîhekê derbas kirin û tevlêbûnaseyranan, rêwîtiyên bi polê û sazîya lênihêrina rojane ya zarokan va.

Mesrefên xwarinên firavînê ji bo zarok û ciwanên kû di piştî nîvro di dibistanê de, di sazîya lênihêrina rojane ya zarokan de, an ji di lênêrîna rojane de ne.

Dayîna lêçûnên ji bo dersa taybet, heger di dibistanê de dijwarîya zarok û ciwan hebin.

Bi kêmanî 150 euro ji bo pêdiviyên dibistanê ji bo her saleka dibistanê, wek mînak wekî alavên werzîşê, pênûs û defter.

Mesrefa ji bo veguheztina dibistanê, heger rêyekê dirêj yê zarok heya dibistanê hebe.